DERGEH

Rezoyê Osê

3

Zarokên min, li bajarê Şamê, min doza seredana gora Mîr Celadet Bedir-xan kir. Em ber bi şêx Xalidê Neqşebendî de hilkişiyan. Me serê xwe li ber mîr çemand. Kurê min got:

"Ez dixwazim derbasî hundirê avahiyê gorê bibim..." Kurik nebihe, lê vê daxwazê serî li min gerand!. Ne kilîta dergeh bi me re ye, ne jî dergevan nas û amade ye!. Lê, min xwe ji vê pirsê, weke tu miyekê ji mastî derbikêşî, bi rewanî kişand. Lê belê, ne tim bextê mirov rûniştiye û dikare, ji medana pirsên zarokan serkeftî derkeve. Erê, li bajarê Qamîşlo jî, zarokan, doza seredan gora Cigerxwîn li min kirin. Tew.

Ez li tiştekê wisa digerim, da ez hunerên xwe pêş zarokan bikim û xwe di çavên wan de bikim dîk!. Lê, tiştê bi serê min hat, bila bi serê gawiran neyê!. Belê, ne tenha dergehê gorê girtîbû, dergehê malê jî girtî bû. Seyda Cigerxwîn di bergeha mala xwe de hatiye veşartin. Kilît nependî bû û te digot, qey dergevan nînî bû!.

Yabo, ma Cigerxwîn kilîta xwe bi xwe re veşartiye!? Kurik pirsî. Vê pirsê ez tar û mar kirim. Min bi rûyekê tirş got: "Kurê min, raw-estana zêde, li ber dergehan ne durist e..." û da ez xwe ji vê gerînokê derxim, min yekser çîroka "Fîrewn û Şeytanî" jê re hewil da

4

Dibêjin, Şeytan bihîst, ku Fîrewn ji miletê xwe re dibêje: "Ez Xudayê we me!." Şeytanî xwest vî xudayî bibîne. Hilkişya ber dergehê eywana Fîrewnî û li dergehî da.

- Ew kî ye Fîrewn pirsî.

Şeytan deng nebir xwe û bersiv neda. Lê, dîsa li dergeh da.

- Ew kî ye Fîrewn pirsî.

Şeytan deng nebir xwe û bersiv neda. Lê careke din li dergeh da.

- Ew kî ye Fîrewn pirsî.

Gava Fîrewn bersiv nebihîst, berê xwe da dergeh û çû dergeh vekir. Dît, va Şeytan li ber dergeh e, got: "Pîso, ev tu yî... deng nabî xwe!"

- Xudayê nezanibe kî li ber dergehê wî ye, ew jî ne xuda ye... pîs e!" Şeytan lê vegerand

- Ya rast: "Ez û tu her du pîs in, lê yên ji me pîstir ew in, yên baw-eriyê bi koranî bi me tînin!" Fîrewn got.

Wilo, min zarok tar û mar kirin û xwe ji pirsa dergehên girtî rizgar kir.